



## Enheten för flerspråkighet, EFF

- Bi dibistanên şaredariyê re û bi yê taybet re dixebite
- Dersa zimanê dayikê li dibistana bingehî, dibistana perwerdehiya taybet, lîse û lîseya perwerdehiya taybet dide
- Alîkariya zimanê dayikê li pêşdibistanê dide
- Alîkariya dersan bi zimanê dayikê dide
- Alîkariya danasîna dibistanê bi zimanê dayikê dide
- Diyarkirina dereceya zanyariyan bi zimanê dayikê pêk tîne
- Ezmûna zimanê dayikê yan jî ya dersa zimanê dayikê pêk tîne

Enheten för flerspråkighet

[flersprakighet@uppsala.se](mailto:flersprakighet@uppsala.se)

018-727 20 26



## Perwerdehiya zimanê dayikê



[flersprakighet.uppsala.se](http://flersprakighet.uppsala.se)



## Kî kare zimanê dayikê bixwîne?

*(Ev ji bo zimanên kêmeteweyên Swêdê ne lê ne.)*

Yek ji dê û bavên xwendekar ji xeynî swêdî zimanekî din weke zimanê dayikê hebe ew xwendekar dikare dersa zimanê dayikê bistîne, eger:

1. Xwendekar di jiyana rojane de li malê zimên bi kar bîne, û
2. Xwendekar di wî zimanê de xwediyê zanyariyên bingehîn be.

Divê xwendekar karibe bi wî zimanê biaxive û fêmkirî bike. Perwerdehî bi zimanê dayikê tê meşandin û li gor plana dersê ya neteweyî bi rê ve diçe.

## Zimanên kêmeteweyên Swêdê

Zimanên kêmeteweyên Swêdê ev in: fînî, meänkieli, samî, romanî û yîdîş. Ji bo xwendina van zimanan divê mirov endamê yek ji van komên kêmeteweyan be. Hewce nake zarok karibe van zimanan biaxive yan xwediyê zanyariyên bingehîn be. Du planên dersê hene û divê mirov diyar bike ka xwendekar ziman diaxive ya dê ji serî ve dest pê dike.

Yekîneya pirzimanîyê —  
Enheten för flerspråkighet  
(EFF) dersa zimanê dayikê li  
Uppsalayê bi rê ve dibe.

## Zanyariyên bingehîn

Zimanên kêmeteweyan ne tê de, ji bo hemû zimanan hebûna zanyariyên bingehîn şert e. Dema ders dest pê dike mamoste zanyariyên bingehîn ên xwendekar kontrol dike û dinirxîne. Hem axaftin tê nirxandin hem jî fêmkirin. Tu karî li ser malpera EFF bixwînî ka zanyariyên bingehîn çi ne.

## Serîlêdana dersa zimanê dayikê

Welîyê/a xwendekar serîlêdanê pêk tîne. Formên serîlêdanê li dibistanan û li ser malpera EFF hene. Formê dagire, îmze bike û teslîmî dibistana xwendekar bike. Midûr ê serîlêdanê bipejirîne û bişîne bo EFF. Divê form ji bo sala pêşiya me herî dawî 15ê meha 6an were teslîm kirin. Ji bo serîlêdanên piştî 15ê meha 6an dana dersê nayê garantî kirin.

## Perwerdehî wiha tê organîze kirin

Li Uppsalayê dersa zimanê dayikê piştî dersên garantîkirî têne dan. Ders li derveyî dersên asayî, piraniya caran piştî ku dersên wê rojê diqedin têne meşandin. Xwendekarên pola F-5an li dibistana xwe dersê distînin. Xwendekarên pola 6-9an di komên hevbeş de li dibistaneke diyarkirî dicivin û berêvaran an jî êvaran dersê distînin. Xwendekar bi xwe têne dibistanê. Eger xwendekar kartê otobûsê nebe mamoste bilêtên otobûsê dide wan.

## Agahiya zêdetir

Li ser malpera EFF agahiya zêdetir li ser perwerdehiya zimanê dayikê ya li Uppsalayê heye.

[flersprakighet.uppsala.se](https://flersprakighet.uppsala.se)

